Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# AGIRÎ


Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, Pdk Îranê Diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (204) 20-04-2013 Buha (150) Tûmen

**salvegera Rojnamegeriya Kurdî pîroz be**

Roja 22'ê Nîsanê salvegera yekemîn rojnameya Kurdî, wate rojnameya 'Kurdistan' ya nemir Miqdad Medhet Bedirxan e. Em di salvegera Rojnamegeriya Kurdî de nemir Miqdad Medhet bi bîr tînin, û silava ji riha pak ya navbirî re dişînin, û hêviya serkevtinê ji tev wan rojnamevanan re dixwazin ku li ser şopa wî kar û xebata xwe dimeşînin.

**Desteya Weşana Agirî**

Çareseriya pirsa Kurd yan çareseriya pirsa PKK'ê



R: 4

Giringiya hukmê Dadgeha Mîkonosê



R: 5

Reforma di yasaya Bingehîn a Tirkiyê de



R: 6

Hêza Ebolfezlê Ebas jî çû Sûriyê



R: 7

# Komîteya Kurd, di «SI» de hate avakirin




Li roja 12'ê Nîsana 2013'an li gor biryara dawîkongireya Înternasyonala Sosyalîst (SI), bi amadebûna 24 partî û rêkxirawên herçar parçê Kurdistanê konfransek bi armanca avakirina komîteyek Kurdî di vê rêkxirawê de, li bajarê Silêmaniyê birêve çû.

Heyetek payebilin ya PDK Îranê bi serperestiya rêzdar Hesen Şerefî di vê konferansê de beşdarî kir.

Hêjayî basê ye ku ew konferans bi amadebûna rêzdar Lûyîs Ayala sekreterê "SI" dest pê kir.Li vê derheqê de rojnameya "Kurdistan" hevpeyvînek bi rêzdar Hesen Şerefî re pêk anî ku berfirehiya vê hevpeyvînê di rûpela 3'ê de hatiye.

## Çaremîn pilînoma Komîteya Nawendî a PDKÎ bi dawî bû

**Berfirehiya daxuyaniyê R:2'ê**



## jiyan, fîdakarî, û destanrêsiyên pêşmergeyên leheng ên PDKÎ. Di rûpela Sitêrkên Hêviyê de.

Necmedîn Salimî:

"Roja dîtina Dr. Qasimlo roja herî xweş a jiyana min bû".

**R: 8'ê**

Şehab Xalidî

# Benda Îmam

sergotar

Serokê Komîsyona bername û budceya Îranê, Xolamriza Misbahî Moqedem, çend roj berî niha ragehand ku geşekirina aboriya Îranê sifir yan jî li jêr sifrê de ye, û me nekariye ku ji derfetan bi qazancê aboriya welatê xwe mifahê wergirin.

Di rastî de roj bi rojê bazineya gemaroyên aborî bo ser Îranê tengavtir dibe, û enfilansiyon (tewerom, helawsan) bi awayek berçav zêde dibe û aboriya Îranê jî hisabî dikeve tengaviyê de. Nirxa her tiştî li Îranê de ew qas zêde bûye ku xelkê Îranê li jêr zexta giraniyê de jiyan ji wan re pirr dijwar bûye, û dewlet jî nikare wek demên berê bi başî nirxa bazarê kontrol bike.

Wezîrê Pîşesaziya Îranê jî radigehîne ku dahatên erzî ên welat li sala borî de 50 milyard dolar bû, lê me texmîn kiribû ku dahata erzî 100 milyard dolar be.

Di budceya sala borî de hatibû ku Îran rojane 2 milyon û 700 hezar bermîlan petrolê dişîne derve, lê evsal yek milyon û 300 hezar bermîl li bername û budeceyê de hatiye nivîsandin.

Ya balkêş ew e ku niha berpirsyarên rejîmê bixwe dibêjin ku li encama tehrîmên navneteweyî de rewşa aboriya welat gihaye vê astê, lê dîsan jî em dibînin ku serhişkiyan dikin û amade ninin ku bersiva erênî bidin welatên rojawayî, da ku xwe ji destê wan tehrîman rizgar bikin, belkû çend rojan berî niha bo tûjkirina zêdetir ya rojawayiyan du binkên din jî bo mehandina Oranyomê li herêmên Saxend û Erdekanê vekirin. Gelo rastî rejîmeke dadperwer dikare xelkê welatê xwe bixe rojek weha de? yan jî karbidestên rejîmê vê bellayê tînne serê xelkê xwe, tenê bona vê ku zulm bigîje astekê ku Îmamê zeman zûtir serê xwe rake, û hem karbidestên rejîmê bi dîtina wî şa bin, û hem jî bixwe dawiyê bi vê zulmê bîne, jiber dawîanîna bi vê zulma stûr tenê karê Îmamê zeman e, ne karê weliyê feqîh û ...hwd.

# Daxuyaniya Deftera Siyasî a PDK Îranê, bi boneya bidawîhatina pilînoma çaremîn a Komîteya Nawendî



**Beşdarên pilînomê di dema behs û gengeşeya li ser pirsên giring ên kurdistan û herêmê**

Ji bo aghedariyê, em radugehînin ku komîteya nawendîa PDKÎ, Hilbijartiyê Kongireya 15'ê PDKÎ çaremîn pilînoma xwe bi beşdariya endamên eslî û cihgirên komîteya nawendî pêk anî, û piştî çar roj karê berdewam dawî pê hat.

Pilînom demjimêr 9'ê sibêdehiya roja Dûşemî 26'ê Xakelêweya 1392'an (15.04.2013) bi ragirtina deqeyekê bêdengî bona rêzgirtina ji riha pak ya şehîdan dest pêkir.

Piştre li çarçoveya destûra karê pilînomê de ku pêştir bi agehdariya endamên birêveberiya PDKÎ gihîştibû, rêzdra Mistefa Hicrî, raporeke siyasî, ku zêdetir guherînkariyên herêmê û rewşa Îran û Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê bi xwe ve girtibû, pêşkêşî beşdarên Kongireyê kir.

Di vê raporê de qala rewşa Sûriyê û dirêjiya şer û kuştara di vî welatî de hatibû kirin, ku bi dehan hezar qurbanî û wêraniyeke zaf lê ketiye û bi milyonan kesî ji xelkê vî welatî, aware û koçberî derve bûne. Rapor sedema vê rewşê û dirêjîkêşana vê rewşê vegerande ser piştevanî û alîkarîkirina hemû aliyane ya rejîma Komara Îslamiya Îranê, Rûsiye û çend welat û aliyên din ji rejîma Beşar Esed, û eva jî di demekê de ye ku piştevaniya xelkê nerazî û serhildêr ê Sûriyê, û rikeberên rejîmê di vî welatî de, zêdetir li warê mirovî de hatiye kurt kirin, û bi sedema durustbûna şik û gumanê ji aliyê rojawayiyan ve derheq dijberan, bi taybet hebûna girûpên Îslamî ên radîkal, ew piştevaniya ji astê çavnihêriya neraziyên vî welatî de nine, lewra weha dixûye ku ew rewşa di vî welatî de hêşta jî bidome.

Raporê tevî baskirina ji rewşa siyasî a Îranê, û aloziyên di navbera rejîma Îranê de, û civaka cîhanî bas ji domkirina rewşa xirap a aborî kiribû, ku jêhelçûna astê enfilasyona dirav heya %30, û bêkariya zêdetir û têkçûna jiyana xelkê li pey xwe re hebûye, û bi berçavgirtina bê encambûna dawî civîna girûpa 5+1, li Qezaqistanê û gefxwarina zêdetir ya rojawayiyan û bi taybetî Amerîka bo ser rejîma Îranê, tê pêşbînîkirin ku rewş ji ya heyî xiraptir be. Di rewşeke weha de ku rejîma Îranê zêdetir ji berê mafên mirovan li Îranê de binpê dike, û zextên bo ser xelkê welat zêdetir kiriye, û ew yek jî tevî berçavgirtina rêjeya îdaman, li rapora Ehmed Şehîd, reporterê taybet ê mafê mirovan a NY derheq Îranê, ku roja 10'ê Xakelêweyê qala vê kiribû, bi awayek zelal ew yek eşkere dibe.

Herweka rapora sekreterê giştî ê PDKÎ qala vê kiribû ku di gel nêzîkbûna dema bi nav hilbijartinên serkomariyê di Îranê de, û helwesta aliyên curbicur ên di nav deshilatdarên rejîmê de, û egera rêgirtin ji berbijariya hinek kes û aliyan, ya li haletê kandîdbûna wan de, retkirina kêrhatîbûna wan, bûye kêşeyek di nav kes û aliyên nav rejîmê de, û ew yek jî di demekê de ye ku bê encambûna her bi nav hilbijartinekê li Îranê de ji xelkê welatê me re eşkere bûye, û vê rejîmê tu demekê îzin nedaye ku hilbijartineke azad birêve here, û giringî bi îradeya wan bihê dan. Bi vî halî jî rejîm hewl dide ku bi pîlanan û bi zorê, xelkekî zaf rakêşe ser sindûqên dengdanê, û weha raxîne ber çavê bîrûraya giştî, ku serbarê vê rewşa ku xelkê Îranê jê bêzar in, û nemana vê hêvî dikin, piştevaniya ji vê deshilatê dikin, ku ew yek jî pîlaneke ku hewce ye xelkê Îranê bona bê bandorkirina vê hewlê bidin û nîşan bidin ku rejîm çawan di astê cîhanî de bi tenê maye, û li navxwe a Îranê de jî, ji vê zêdetir îzole bûye û xelk bi tewahî jê bêzar in, û tev alî jî, ...

Dom R:9

Birêz Hesen Şerefî cihgirê sekreterê giştî ê PDKÎ:

# "Li ser bingeha hewl û tekoşîna PDKÎ, piştî çend salan YNK û BDP jî wek endam li "SI" de hatin wergirtin".

## Piştî vê ku li ser biryara Înternasyonala Sosyalîst konferansek li bajarê Silêmaniyê de birêve çû, û PDKÎ û BDP wek hevcihgirê serokê Komîteya Kurdan hatin hilbijartin, rojnameya Kurdistan di gel birêz Hesen Şerefî cihgirê sekreterê giştî ê PDKÎ hevpeyvînek pêk anî, ku eva deqê vê hevpeyvînê ye:




**Pirs: Gelo bi kurtî hûn dikarin ji mere basê çawaniya birêveçûna vê konfransê di bajarê Silêmaniyê de bikin?**

Bersiv: Hevkarî û hevpeywendiya PDKÎ digel "SI", weke rêkxirawek girînge navnetewî vedigere bo zêdetir ji 20 salî berî niha ku Dr. Qasimlo weke sekreterê giştî yê wî çaxî ê PDKÎ giringiyek taybet dida vê peywendiyê û di encam de li zêdetir ji 15 sal berî niha PDKÎ weke endamê şêvirmend di vê rêkxirawê de hate wergirtin û piştre pileya wê ji şêvirmendiyê ve bo çavedêr hete bilindkirin, di vî heyamî de PDKÎ hewlek zaf da ku "SI" di gel doza Kurdan li hemû parçên Kurdistanê de nasyar bike.

Di heman demê de PDKÎ kar dikir bona vê ku hêz û aliyên siyasî yên din yê Kurd jî di vê rêkxirawê de weke endam bihên wergirtin û bi xweşî ve niha du rêkxirawên din jî weke YNK û BDP di refa endamên vê rêkxirawê de cih girtine, û piştre birêz mam Celal Talibanî jî weke yek ji cihgirên sekreterê giştî ê "SI" hate hilbijartin, û piştî wê jî her li pêvajoya çalakiyên ji bo doza Kurdan li "SI" de, kar li ser vê hate kirin ku grûpeke kar a Kurdan bi beşdariya çend hizb û aliyên Ewrûpayî li "SI" de pêk bê, ku ev yek wê demê cîbecî bû.

Herçend vê girûpê bi başî dest bi karê xwe kir, lê di van salên dawiyê de tekoşîna wê kêmreng bû. Lewra li kongireya "SI" de pêşniyar hate kirin ku vê carê komîteyek ji bo Kurdan pêk bê ku astê wê ji girûpê sertir e. Bi xweşî ve ew pêşniyar hate pejirandin û di civîna Silêmaniyê de Komîte hate avakirin. YNK wek serokê komîtê û PDKÎ û BDP weke hevcihgirên serokê komîtê hatin hilbijartin.

> PDKÎ bi vê derbazbûyiya dûr û dirêj ku di gel "SI" de heye, û di vî warî de pirr ceribandinên xwe hene, gellek asayî ye ku di wan civînan de bandora xwe hebe, her bi vê sedemê jî PDKÎ weke hevcihgirê serokê komîtê hate hilbijartin.

**Pirs: Gelo giringiya pêkhatina vê civînê di Kurdistanê de çî ye?**

Bersiv: Ew civîn bi amadebûna Loîs Ayala sekreterê giştî yê "SI" û heyeta deftera "Pap Andro" serokê vê rêkxirawê û 24 partî û aliyên siyasî yên Kurd roja 12'ê Nîsanê li bajarê Silêmaniyê birêve çû. Giringiya birêveçûna vê civînê di Kurdistanê de, ya yekem nîşaneya giringîdana wan bi pirsa Kurd û pêkhatina komîteya Kurdî ji aliyê "SI" ve, û ya dûyemîn jî ew bû ku derfet bo piraniya herî zaf ya aliyên siyasî ên Kurdistanê pêk anîn ku têde beşdar bin, û bîr û boçûnên xwe di vê derheqê de eşkere bikin û bi amadebûna wan komîta Kurdan li "SI" pêk bê.

**Pirs: Gelo heya çi astekê partiyên Kurdistanî li ser birêveçûna vê civînê bandora xwe hebûn?**

Bersiv: Hemû ew partî û aliyên siyasî ku di civînê de beşdar bûn rolê erênî hebûn û hemûyan jî nêrînên xwe li ser rewşa Kurdan li herçar perçên Kurdistanê û li peywendî digel kar û erkên komîta Kurdî di "SI" de eşkere kirin û pêşniyarên baş kirin.

**Pirs: Gelo rolê PDKÎ di vê civînê û bidestxistina cihgiriyê di komîteya Kurdan li "SI" de çi giringiyek heye?**

Bersiv: PDKÎ bi vê derbazbûyiya dûr û dirêj ku di gel "SI" de heye, û di vî warî de pirr ceribandinên xwe hene, gellek asayî ye ku di wan civînan de bandora xwe hebe, her bi vê sedemê jî PDKÎ weke hevcihgirê serokê komîtê hate hilbijartin.

Diyare ku em pêdagir bûn li ser vê ku ew komîte çalaktir û berdewamtir be li "SI" de, û karê berdewam bike bo doza Kurdan li herçar perçên Kurdistanê, û giringiyek tewaw bide rewşa Kurdan û bi vê hilbijartinê jî emê hest bi erkek giringtir bikin û emê hewlê ji bo pêşvebirina doza Kurdan li herçar perçên kurdistanê de bidin.

# Çareseriya pirsa Kurd yan çareseriya pirsa PKK'ê



Rostem Cehangîrî



Piştî çendîn hevdîtinan di navbera rêzdar Ebdulla Ocelan û serokê Mîtê, hate ragehandin ku di newroza îsal de vê mizgîniyek pir xweş bidin xelkê Kurdistanê bi giştî û xelkê Turkiyê û Kurdên di vî welatî de bitaybetî, Eva bû ku di 21'ê Adara 2013'an û di newroza Kurdan de ew mizgînî hat ragehandin. Nameya vekirî ya rêzdar Ocelan hat xwendin û ji aliyê nêzîk bi du milyon kes ji xelkê kurdistanê ku li mîtînga Amedê li hev civiyabûn hate pêşwazîkirin û ev yek bi awayek rasterast li medyayên Kurdî û Turkî û cîhanî de hate belavkirin. Em dikarin bêjin ku newroza Amedê ji aliyê bi dehan milyon kes ji xelkê cîhanê ve ji rêya ragehandinê giştî ve hate dîtin û guhdariya nameya ocelan hate kirin.

Xelkê Kurdistana bakûr ku ji şer û malvêraniyê êşeke zaf dîtin, bi vê peyamê pir keyfxweş bûn, herwusa ya ku hêjayî basê ye ev e ku ji aliyê rêbertiya PKK'ê li Qenîlê agirbest hate ragehandin û bersiva erênî dane pêşniyara rêberê xwe. Heta vira hem PKK û hem jî BDP bi raya min biryara wan di cihê xwe de bû, bona vê ku gotin em aştiyê dixwazin û em daxwazkarê çareseriya pirsa Kurd ji rêka diyalogl ve ne. Ya herî girîng ew bû ku wan rêberê xwe bi tenê nehêlan û ragehandin rêberê wan çi bixwaze ew dê cîbicî bikin.

Li vir de ez dixwazim bîr û hizra xwe li ser pêvajoya binav çareseriyê bixim ber bas û qezawetkirina di vê derheqê de ji bo xwendewanên vê gotarê bi cî bihêlim.

Bi hizra min ya ku hat kirin heya niha bi awayek yekalî ji aliyê PKK'ê ve bûye û li hember de dewletê tu pêngavek hilnegirtiye. Peyva terorîst ji bo wan her bikar tînin, dibêjin emê dawiyê bi şerê terorê bînin lê basa pirsa Kurd bi tu awayî nakin. Heta ew yasayên ku di wan rojan de li parlemêntoya Turkiyê de hatin pejirandin ku peywendî bi girtiyan ve heye, bi tu awayî girtiyên doza KCK'ê bi xwe ve nagire û dibêjin ew alîgirên girûpek çekdar in û nahên azad kirin.

Yan pirsek din ev e ku hêzên çekdar ên PKK'ê li Bakûr dê vekêşin û piştre wê çekan danên û yên ku dest di kuştinê de tunebûne dikarin vegerne welat û piştî dadgehîkirinê serbest bên berdan û yên di şeran de dest di kuştinê de hebûne, hekî vegerin welat, wê bên girtin û dadgehîkirin.

Pirsa herî girîng ev e ku gelo pirsa Kurd di vê pêvajoya çareseriyê de li kuderê ye? Gelo ev hemû xwînên ku hatin rêjandin bona çi û li ser hisaba kê dibe? Gelo persiva malbatên wan hemû goriyên kurd wê kî/kê bide?

Diyare ku di vê çareseriyê de bersiva malbatên kuştiyên dewletê hatiye dan, ev jî ev e ku me şer bi dawî anî û welat ji dabeşbûnê rizgar kir û êdî em ji niha pêve tu kuştiyan nadin. Lê mixabin malbatên şehîdên kurdan Tu bersivek wernegirtine. Di vê pêvajoya çareseriyê de Kurdan tu deskevtek bidest nexistine. Divêt bîr ji vê bê kirin ku pirsa Kurd dixwazin çaraser be, yan ne?

Li vir de dixwazim vê yekê bêjim ku hem Kurd û hem dewlet û hem jî PKK dibe baş bizanin ku hekî pirsa Kurd çareser nebe, aştî di welat de cihgir nabe.

Di rastî de ev yek derfetek başe ku hatiyê pêş û çavdêrên siyasî û rewşenbîrên Turk û Kurd dibe bêdeng nebin û vê pirsê ji xelkê Turkiyê re şirove bikin. Divê Kurd weke neteweyek cuda ji netewa Turk bi fermî bê naskirin û li ser çareseriya pirsa Kurd diyalog bê kirin û bigîjn çareseriyek mentiqî û dirust, nabe tu aliyek di vê pêvajoyê de xwe bi dorandî bizane, divêt tev alî xwe bi serkevtî bizane, di vî warî de barek giran li ser milê Turk û desthelatdarên Turk e. Hekî ev bixwazin ku dengê wan di herêmê de hebe û bandora wan jî li ser pirsên herî girîng di herêm û cîhanê de hebe, divêt pirsa Kurd wek heye bibînin û rûpelek nû hildin.

Divêt PKK jî tev aliyê Kurd bibîne û dengên rengarengiya civaka Kurd li dewra xwe bi hemû bîr û hizran ve kom bike û yek dengî pêk bîne, hekî wusa nebe, dîroka pir ji xwîn a Kurdan ji wan xweş nabe.



# Giringiya hukmê Dadgeha Mîkonosê

Luqman Mêhfer




Dadgeha Mîkonosê, roja 28'ê Oktobera 1993 dest bi karên xwe kir û li roja 10.04.1997 hukmê xwe ê dawiyê ragehand. Ew heyam bona pêregihîştin û biryardana li ser dosyeyekê li dadgehê de li gorî yasa û rêsayan demeke zêde ye, lê dirêjbûna karê dadgehê û giringiya hukmê dadgehê, ji çend biyavan ve cihê balkêşandin û lêfikirînê ye, û ji dîtingeha yasayî û siyasî û dadweriyê ve giringiya taybet bi xwe heye. Ew astengiyên ku li pêşberî dadgehê de hebûn, hewce ye ku qala wan were kirin.

Ya yekem ew e ku dewleta Alman û hinek ji karbidestên wî welatî, zext dixistin ser dezgeha dadwerî ku bi awayekê dadgeh bê dirêjkirin ku dosye bê kêmreng kirin, bi awayekê ku berjewendiya dewleta Alman di warê dîplomasî û aborî de nekeve tehlûkeyê.

Ya duyemîn ew e ku bona vê ku dadgeh bikare bi awayek durust pêvajoya xwe bidomîne, diviya pêştir astengên yasayî çareser kiriban, û yên ku diviya lêkolîn bi wan re bihatiba kirin, şahid û ên şakî, her hemû li hemberî dadgehê de berhev bin, ku ew yek jî hewcehî bi rezayeta çar welatan hebû. Di vê navberê de jî du welatên wek Îran û Lubnan bixwe tawanbar bûn, ku ew yek jî astengek mezin bû li pêşberî dadgehê, jiber ku qurbanî xelkê yek welat û terorîst jî xelkê du welatan bûn, û şahîd jî xelkê Alman, Îran, Lubnan û Turkiyê bûn, û herweha bûyer jî li welatê Alman de bû.

Ya sêyemîn ew bû ku li sîstema yasayî ya Alman de esla "Tebreê", xalek cihê hurmetê ye. jiber ku divêt tawanbarbûna bergumanan bê selimandin. Jiber ku tewaya lêkolînan vê demê aliyê yasayî bi xwe ve digre, ku li dadgehê de rast û durustbûna wan bê piştrast kirin, lewra dadgeh neçar e ku ser ji nû lêkolînê dest pê bike.

Li dîroka hatine ser kar a Komara Îslamiya Îranê, eva yekem car bû ku ji hêla dezgeha dadweriya welatekê ve hukmê girtina wezîreke welatê Îranê bi tawana beşdariya li kiryareke terorîstî de dihate derkirin.

Ew yek jî gellek giran li ser karbidestên rejîma Îranê tewaw bû, ji aliyek din ve dezgeha dadweriya welatê Alman dawakarê giştî ê federal, û serok û dadwerên dadgeha Mîkonosê gellek hûrbînane û cesûrane, erkê yasayî û exlaqê ê xwe bi cih anîn, ku ew jî mirov dikare ji du dîtingehan ve lê binêre. Ya yekem: çanda dadperwerî û piştgirî ji mafên mirov li nav xelkê xwe de cihgir kiriye, ku weha bû hînbûna bi vê kulturê, hêviyeke mirov e û azadîxwaz ji mêjve ye ku xebatê jêre dikin. Ya duyemîn: wek xûdîkekê ye ku naweroka rastîn ya karbidestên Komara Îslamiya Îranê nîşan da. Lewra serbarê hebûna pêwendiyek xurt a bazerganî li navbera Îran û Alman, qazancên aborî û gefxwarinên rejîmê nekarî pêşiya birêveçûna dadperweriyê bigre, û serbixweyiya dezgeha dadweriya Alman hate selmandin.

Bi kurtî şûnwarê yasayî ê hukmê dadgeha Mîkonosê, karî li ser astê nîştimanî û navdewletî rewşekê pêk bîne ku derfetê nede tawanbar, ku ji dest dadgehê rizgar be, îca ew tawanbar li her pileyek mezin a hikumetî de bin.

Divêt hemû aliyek vê rastiyê qebûl bikin ku eva dadgeha Mîkonosê bû ku karî pêşiya sîstema terorê a rejîma Îranê li derveyî welat bigre. Vê dadgehê li civîna fermî ya roja 10.04.1997'an de bi biryarek cesûrane û dadperwerane rêberên komara Îslamiya Îranê li pileya herî bilind ya deshilatê de wek biryarder û bikerên terorkirina Dr. Şerefkendî bi cîhanê da naskirin, û hukmê girtinê jî bo çend kes ji ên ku dest li birêvebirina biryara terorê de hebû, derkir . Ew hukmê dadgeha Mîkonosê belgeyeke haşahilnegir ya yasayî ye ku li dest tev alîgirên azadiyê û piştgirên mafê mirov de heye ku rejîma Îranê pê mehkûm bikin û rê bihê xweşkirin bo vekirina tewaya wan dosyeyên ku li arşîva dezgehên qezayî de hatine piştguh ve xistin, wek dosyeya terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî li Vîyenê, û ...hwd.

## Nerîna Lîderan



Ocalan:

**Hewce ye ku çar konfransên cuda cuda li Hewlêr, Amed, Enqere û Ewrûpayê pêk bên.**



Obama:

**Emê bikerên cînayeta Bostonê bidin destê dadgeha îdaletê.**



Mihemed Husênî:

Mûzîsiyenên rexnegirê Komara Îslamî ne, îzna birêvebirina konsêrtê di hûndûr Îranê de ninin.



Mihemedriza Hicazî:

Em berhevê jinavbirina Têlawîvê ne.

# Reforma di yasaya Bingehîna a Tirkiyê de

Şehab Xalidî





Ew yasaya bingehîn a Turkiyê ku piştî derbeya leşkeriya 12'ê Îlona 1980'î ji aliyê jeneralan ve bi ser gelên Tirkiyê de hate sepandin, û li ser bingeha vê yasaya bingehîn ya Tirkiyê çendîn salî siyaseta înkar û asîmîlekirina neteweyên akinciyê Tirkiyê ji aliyê deshilatdarên vî welatî ve ji riyên çandî, siyasî û leşkerî ve birêve çû, lê bi xweşî ve piştî vê ku li rapirsiyeke giştî de piraniya xelkê vî welatî deng dane reforma di yasaya bingehîn de, niha reşnûsa vê yasayê li parlementoya Tirkiyê de behs û gengeşe li ser tê kirin.

Di rastî de dengdana piraniya xelkê Turkiyê bi pêkanîna reforman li yasaya bingehîn de, nîşaneya vêzariya xelkê vî welatî ji ferq û cudahîdanîn û şer û tundûtîjiyê ye û êdî ew jî hatine ser vê baweriyê ku şer çareser nine bo vegerandina aştiyek cihgir û tenahiyeke berdewam di vî welatî de.

Karnasên siyasî li ser vê baweriyê ne ku jiber ku AKP li hewla vê yekê de ye ku sîstema deshilatdariya Turkiyê bike serokatî, lewra hewcehî bi alîkarî û piştevaniya BDP heye, lewra jî BDP dikare li hemberî piştevaniya ji AKP hinek poanan ji AKP wergire. Giringtirîn destewaje û têgeha li yasaya bingehîn de ku BDP pêdagiriyê li ser guherîna wê dike, destewajeya "hemwelatiyê Turk" e, ku destewajeyeke tewaw nejadperestane û pirr ji ferq û cudahîdanîn e. Şarezayên karûbarê Turkiyê li ser vê bawerê ne ku AKP bi bê rezayeta CHP, dengê xwe nade guherîna vê destewajeyê. Jiber ku heke AKP bi bê rezayeta CHP, dengê xwe bide guherîna vê destewajeyê, wê demê partiyên netewexwaz û bi taybetî MHP û CHP dikarin ku Erdoxan û partiya wî, bi îxanet û dûrketin ji armancên Ataturk û hewildana bo parvekirina welat tawanbar bikin, û hesta netewexwaziya alîgirên Erdoxan bilivlivînin, û dengê wan bo aliyê xwe rakêşin.

Lewra jî îhtimala vê yekê heye ku AKP li hemberî razîkirina CHP bi guherîna vê destewajeyê, bixwe desta ji dengdana bi wan madeyên yasaya bingehîn bîne, ku giringiya guherîna wan li çav destewajeya "hemwelatiyê Turk", ji her du aliyê BDP û AKP re kêmtir be.

Bê guman di vê rewşa hestyar ku niha Turkiye têde ye, û piroseyek bi navê piroseya çareseriyê dest pê kiriye, pêkanîna reformeke demokratîk di vê yasaya bingehîn de, dikare pêngavek demokratîk û di hemen dem de yasayî be bo berçavgirtina îrade û daxwaza tewaya pêkhateyên di nav Turkiyê de.

Di welatekê de ku her ji serdemê deshilatdaraiya Osmaniyan ve heya deshilatdariya Kemalîstan, beşeke zaf ji xelkê vî welatî li diyarîkirina qedera xwe de tu roleke wan tunebûye, niha ronahiyek tê dîtin û hewil bona darêtina yasayeke bingehîn a medenî tê dan, û rê ji bo demokratîzekirina Turkiyayekê tê xweşkirin ku Kurd bikarin ji riya xebateke siyasî û medenî hewlê bidin da ku mafên xwe bi dest bixin. Lewra heke Erdoxan û partiya wî bikarin ku dawiyê bi şer û tundûtîjiya çekdarî di welatê xwe de bînin, û rê ji bo çareseriya pirsa Kurd xweş bikin, ew yek dikare di dîroka Turkiyê dewek xaleke zêrîn li karnameya AKP li sala 2013'an pêve çav lê bê kirin.

Bêguman dawîhatina bi şer di vî welatî de û rê xweşkirina ji bo xebata siyasî û medenî dikare Turkiyê pêngavek din bi endametiya di YE denêzîk bike, û ji aliyek din ve, wê demê sîstema laîk û demokratîk ya Turkiyê, dikare alîkarê Turkiyê be di vî warî de ku Turkiye bibe modelek baş bo tewaya welatên herêmê.

Di Turkiyeyek weha de Kurdên vê beşê ji Kurdistanê dikarin pêngav bi pêngav û ji riya xebata medenî û siyasî ve, û bi awayek bihêz daxwaziyên xwe ji riya şeqam, parlemento û ragehandinên giştî ve bînne ber bas û hewleke berdewam jêre bidin, û bi vî awayî bikarin bala bîrûraya giştî a cîhanê û bi taybetî rojawayiyan bo aliyê xwe rakêşin, ku bê guman li sedsala 21'an de, ew şêwaza xebatê dikare gelê Kurd di vê para Kurdistanê de bi mafên wan nêzîk û nêzîktir bike, ta şerek çekdarî a tundûtîj ku hêceteke zêdetir bide dest nejadperestan bona înkara şûnas û nasname û kultura neteweya me. Bi hêviya vê ku sedsala 21'an bibe sedsala gihîştina Kurdan di tewaya beşên Kurdistanê bi mafên xwe.



# Hêza Ebolfezlê Ebas jî çû Sûriyê

Arif Vêlzî

Hekî em rûpelên siyaseta Komara Îslamî a Îranê derheq Sûriyê di du salên derbazbûyî de hildin, gellek bi başî dixûye ku Komara Îslamî di warê aborî, û herweha çek û teqemeniyan de piştewaniyê ji hikumeta sûriyê dike, bi awayekî ku cuda ji belavokên ser torên civakî û ragehandinên fermî û nefermî ên opozisyona Sûriyê derheq hebûna destê Komara Îslamî li pişt tepeserkirina xelkê azadîxwaz ê Sûriyê, bi deyan kes ji berpirsyarên payebilind ên nawendên ewlehî û leşkirî ên Komara îslamî bitaybetî berpirsyarên Sipaha Qods li Sûriyê ji aliyê Artêşa Azad ve di dema şer li dijî opozisyon û xlkê de hatine destbiserkirin, û piştewaniya sîstmatîk a Komara îslamî ji hikûmeta Beşar Esed eşkere kirine.

Komara Îslamî di pêngavek nû de bona tepeserkirina şoreşvanên Sûriyê û herweha li hember destkevtên opozisyon û dewleta demekî a vî welatî, bi kiryar û bi guhertina faza piştewaniyên xwe ji sîstema daxistî li Sûriyê, nîgeraniya xwe nîşan da.

Bi awayekî ku çend roj berî niha medyayên cîhanî nûçeya avakirina hêzekê bi navê hêza “Ebûlfezlê Ebas” ji aliyê Sipaha Qods ve hat belavkirin ku ji grûpên Şî’e ên Îraqê, Hizbullaha Lubnanê, hêzên Sipaha Pasdaran û Besîc û hindek ji Şî’eyên Efxanistan û Pakistanê pêk hatiye. Çekdarên vê hêzê piştî dîtina fêrkariyên taybetî ên şerkirinê di Îraq û Sûriyê de, diçin nav piroseya tepeserkirina dijberên hikûmeta Esed.

Herçend di despêkê de hate ragehandin ku hêza Ebûlfezlê Ebas bi merema parastina cihên pîroz ên Şî’eyan di Sûriyê de hatiye avakirin, lê piştre ev gumana ji aliyê opozisyonê ve hate piştrastkirin ku hêza Ebûlfezlê Ebas netenê bo parastina cihên pîroz nehatiye avakirin, belkî li herêmên Elqabûn, Heceroleswed û Hey Eltezamon de mil bi milê hêzên Beşar Esed dest avêtine şer li dijî opozsyonê.




Eva di demekê de ye ku Sipaha Qods bona rêxweşkirin û herweha bona rewayîdan bi kuştar û destêwerdan di karûbarên Sûriyê de, hukmê fetwayê ji Ehmed Heso moftiyê derbarê Beşar Esed li dijî xelkê nerazî di Sûriyê de wergirt û bi vî awayî, rijandina xwîna xelkê Sûriyê helal û şerkirin di pêxema mana deshilata Beşar Esed di Sûriyê de weke erkek şer’î û Îslamî da nasîn.

Lê eva ku cihê dilxweşiyê ye ev e ku, serbarê hewlên Komara îslamî bo têk birina bizava mafxwazane ya gelên Sûriyê, opozisyon çi li ser astê navnetewî û li nawendên cîhanî û navçeyî de çalak û xwediyê piştewaniyek baş a dewletên herêmê ye, lewra bi fermî weke nûnerê gelên Sûriyê di Komkara Erebî de hatin wergirtin û karîn ku dewleta demekî di vî welatî de ava bikin û, çi li ser astê navxwe û leşkirî ve karîn ku rojbiroj serkevtinên zêdetir bidest bixin û bajar bi bajar û gund bi gundê xwe ji artêşa hikûmeta Be’s paqij bikin.

Eva ku nabe civaka cîhanî û bixasmanê gelê Sûriyê jibîr bikin ev e ku berpirsyar û karbidestên Komara Îslamî bi sedema vê ku mil bi milê hêzêzn Esed bi sedan tirajidya û cînayetên mirovhejîn di Sûriyê de afirandine, dibe di pêşerojê de li dadgeha navnetewî a tawanên li dijî mirovahiyê de, bihên dadgehîkirin û bigîjin cezayê kiryarên xwe.

---

Rojev

## Koreya Bakûr

A: Kamyar

Sûpaya Koreya Bakşûr bi sûpaya pêncem a cîhanê tê hesibandin. Gefên Koreya bakûr li dor êrîşa bo ser Amerîka û hevpeymanên wê, vê pirsyarê çê dike ku gelo sûpaya vî welatî di çi astekê de ye ku bi vî awayî gefan li Amerîka û hevalbendên wê dixwe?

Hêz û alavên leşkirî ên sûpaya Koreya Bakûr bi vî awayî ne:
Hejmara leşkerên di refên arteşê de: 1 milyon û 300 hezar çekdar
Hejmara leşkerên yedek (bedîl): 8 milyon û 200 hezar kes
Hejmara hemwelatiyên ku dikarin di karûbarên leşkirî de beşdariyê bikin: 10 milyon hemwelatî
Hejmara Zirêhpûşan (neferhelgir): 5 hezar û 500 neferhelgir
Hejmara Tankan: 2000 û 600 Tank
Hejmara Topan: 5 heya 7 hezar Top
Mûşekên biçûk: 1600 heya 3000 Mûşek
Hawen: 2000 Hawen
Mûşekên dije Tank: 17 hizar Mûşek

Deryayî: 710 alav ku 70 alav ji wan jêrbehrî (jêr deryayî) ne
Şiyana Etomî: Şiyana Etomî ya Koreya Bakûr gefa yekemîn e bo ser her welatek cîhanê. Herçend hûrdekariyên wê nehatine eşkerekirin, lê Koreya Başûr vê yekê radigehîne ku kariye hêz û şiyana Etomiya Koreya Bakûr di duyemîn ceribandina xwe de eşkere bike. Li gor zanyariyên ku Koreya Başûr bidest xistine, Mûşekên vî welatî dikarin serbarê hilgirtina 600 kg barê xwe, bigîjin 10 hezar kîlometriya xwe.
Peywendiyên herêmî ên Koreya Bakûr: Peywendiyên bihêz digel Çîn, Rûsiye, Îran, Sûriye û Viyetnamê.

Çavkanî: Malpera Xendan



**Necmedîn Salimî naskirî bi Necmedîn Paweyî kurê Kerîm, sala 1331'ê li gundê Daryan a ser bi bajarê Pawê hatiye dinê. Bi sedema destengî û hejariya bav û malbata xwe nekariye here xwendingehê û her di zarokatiya xwe de dest bi kedkariyê kiriye.**

**Hevpeyvîn: Arif Vêlzî**

Necmedîn derheq destpêka nasiyarî û tevlîbûna xwe bi PDK Îranê re weha dibêje; "Piştî nemana Komara Kurdistanê, rejîma Pehlewî her sal di salvegera herifandin Komara Kurdistanê û bidarvekirina Pêşewa Qazî Mihemed li piraniya bajar û gundên derdora me cejnek bi navê cejna 2500 saliya şahenşahî û cejna jinavbirina Komarê birêve dibir. Çûna cejnê bi zorî bû, lewra xelk bi neçarî beşdar dibûn.

Di dema cejnê de gelek pêşmergên serdemê Komara Kurdistanê di gundê me de hebûn ku basa Komarê û PDK Îranê û bi giştî xebata mafxwazana ye gelê Kurd ji mere dikirin û bi vî awayî min PDK Îranê nas kir. Sal derbaz bûn û sala 1357'ê rejîma Pehlewî ji nav çû û PDK Îranê xebata xwe eşkere kir. Li herêma "Tewêle" û derdora "Dizawerê" şikevtek hebû ku binkeya PDK Îranê têde bû û Seyid Riza Dirûdger berpirsê binkeyê bû. Min du caran xwe bi binkeya partiyê nasand û min daxwaza pêşmergatiyê kir. Wan bi sedema hejariya malabata me, ez cardin şandim mala xwe, lê sala 1358'ê ez cardin çûm û bi sedema pêdagiriyê weke pêşmerge hatim wergirtin û bi fermî çeka PDK Îranê min kire milê xwe.

Necmedîn roja herî xweş a jiyana xwe weha anî ziman; Piştî kîmyabarana Helebçê ez bona karê partiyê şandim Qendîlê. Li wir bi sedema pirsgirêkekê ku ji min re hatibû pêş, min daxwaza dîtina Dr. Qasimlo kir. Dr. Qasimlo daxwaza min qebûl kir û ez çûm min dît ku wî berçavk lêdane û kitêbê dixwîne, min arîşeya xwe. Wî gote min ku xwe nerihet neke. Wê ew arîşe vê çêbe. Heyamê du demjimêran ez cem Dr. Qasmlo mam û ew du demjimêr roj û demjimêrên herî xweş yê jiyana min bûne heya niha.

Di hember de jî roja herî nexweş a jiyana xwe weha tîne ziman;" Sala 1366'ê û di dema kîmyabarana Helebçê de 900 kes ji kadr û pêşmerge û malbatên PDK Îranê di navbera hêzên Komara Îslamî û hêzên dewleta Îraqê de heyamê 5 rojan mabûn.

Her şev em demjimêr û nîvekê rê diçû, lê xeber dihat û digotin vegerin, şer xurt e û tu kes derbaz nabe. Pir zehmet bû, baran dibarî û hewa pir sarr bû û bi sedema baranbarîn û heriyê pêlavên min diriyan û ez pêxas mam, şeva dawiyî ragehandin ku divêt hêz bi tewahî û bilez li rêya çiyayê pişta Seyd Sadiq ve bo herêma Şaneder bikeve rê, demjimêr 9'ê şevê ez bi pêxasî tavî hêzê birê ketim heya demjimêr 8'ê spêdeya roja paştir em gehiştin "Zereyan"ê. Di wî midehî de cemedanî û Kanfayek xwe ku min li dewra piyê xwe alandibûn, min dirandin. Ev şeva herî nexweş ê jiyana min bû, çûnkî heyamê 10 rojan ketim û min nedikarî rabim ser piyê xwe".

Necmedîn Salimî dibêje; "Bi sedema destengiyê min nedikarî ku ez jiyana hevpar ava bikim, lewma ez gelek paş ketim, min hevdem digel pêşmergatiya xwe dest avêt karê kedkariyê û di encam de di Havîna sala 1383'an de, li binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê li Koyê min jiyana hevpar digel "Xatûn Mihemed" pêk anî û berhema jiyana min jî kurek e.

Birêz Necmedîn weke pêşmergeyek dêrîn û xwedî ezmûn rû li xelkê Kurdistanê dike û dibêje; "Bîr û hizrên xwe vekin û êdî li Komara Îslamî qebûl nekin ku bi dilê xwe tiryak û madeyên hişber di nava civakaê de balev bike. Haydar bin ku Komara Îslamî bi tenê bi PDK Îranê nahê herifandin, lewma daxwazê ji xelkê dikim ku weke xelkê xweragir yê Sûriyê rabin û pêşmerge û PDK Îranê li pêşta we ye. Jiber ku Komara Îslamî nikare hemû xelkê Kurdistanê bikuje".



## Doma R:2'ê

... li şanosaziyên bi nav hilbijartina li komara îslamî de şareza ne.

Derheq pirsa Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê de, rapor bi awayek hûr li ser wan sekinî bû, û derheq rewşa Kurd li Sûriyê ronahî xistibû ser helwesta Kurdan li vî welatî de, ku niha ji aliyê hêzên serkûtker ên Beşar Esed ve, ketine ber êrîşê û aliyê opozisyonê jî hevgirtina hewce di gel Kurd di vî welatî de pêk neaniye, bona vê ku Kurd di vî welatî de, zêdetir bi bandor be, û bigîje beşek ji mafên xwe yên rewa. Hewce ye ku hêzên siyasî hevgirtîtir bin û bername û daxwazên rohn û zelal hebin ku em hêvîdarin vê rewşê bipîve û li encam de li Sûriyeya piştî Beşar Esed ew êş û azar ji wan dûr keve. Di vê raporê de bas ji herêma Kurdistanê û pêwendiya li gel deshilata nawendî li Îraqê jî kiribû ku komek arîşeyan ew pêwendî berev lawazbûnê ve biriye, û ji aliyeke din ve kêşeya xortên neteweya Ereb di vî welatî de, bi dabeşbûna bi ser Şîe û Sûniyan de berçavtir bûye, û zêdetir li ser vê bawerê ne ku hikumeta nawendî ya niha a Îraqê hewla tekrewî û piştguh ve avêtina yasa û lihevhatinên berê dide, ku ew yek jî nikare li berjewendiya Îraqê bi giştî de be. Pilînomê hêvî kir ku ew arîşe bi hestkirina bi rastiyan ji aliyê deshilata nawendî ve, ji riya lojîk û li gorî yasayê were çareserkirin.

Li raporê de rewşa Kurd li Kurdistana Îranê û doma serkût û îdamên ku rejîm derheq nxortên neteweya Kurd li Îranê de dike, û herweha rewşa xirap ya jiyana xelkê û bêkariya zaf, û herweha emniyetîkirina zêdetir ya civakê û geşandina nesaxiyên civakî, ji aliyê rejîma Îranê ve bi hûrî îşare pê hatibû kirin û di hemen dem de xweragiriya xelkê û pêdagirbûna xortên neteweya Kurd li Kurdistana Îranê li ser mafên neteweyî û demokratîk ên Kurd bi çavê rêz û hurmet ve lê hatibû nihêrîn.

Raporê her di pêwendî li gel Kurdistana Îranê de, siyaset û helwest û tekoşîna PDKÎ, li navbera du pilînomê de raxistibû berçavan, û îşare bi aliyên curbicur ên wê kiribû, û pêwendiya PDKÎ di gel hêz û aliyên siyasî ên opozisyona Îranî, û hêz û aliyên siyasî ên Kurd li Kurdistana Îranê, bi awayek baş nirxandibû, ku bi xweşî ve pêvajoya berev pêşveçûnê dipîve.

Rapora siyasî derheq Turkiyê û Kurdistana Turkiyê de, tevî baskirina ji komek mijaran, pêvajoya aştiyê li vî welatî de û gotûbêjên karbidestên hikumeta Turkiyê di gel birêz Ebdulla Ocelan bilind nirxandibû. Li vê derheqê de pilînomê guhertinên vê dawiyê li Turkiyê û Kurdistana Turkiyê de bi awayek hûr xiste ber bas û pêvajoya çareseriya aştîxwazane ya navbera her du aliyan de wek pêngaveke erênî hesibandibû. Li hemen dem de li ber ronahiya vê peyamê û wan axavtinên ku heya niha ji aliyê her du aliyan de hatine bilavkirin, daxwazeke rohn û diyarîkirî li pêwendî li gel Kurd û mafên neteweyî li vî welatî de nehatiye ber bas, lewra bi nîgeranî ve çav li encama vê piroseyê tê kirin, bi vî halî jî biryardana li ser çawaniya diyarîkirina çarenûsa xûşk û birayên me di vê beşê Kurdistanê de, pêwendî bi wan xwe ve heye û em rêz ji bo îradeya neteweyî li vê beşa Kurdistanê de dadinên. Li hemen dem de em hêvî dikin ku doma vê pêvajoyê bo xêr û xweşî û bidestvehatina hindî zêdetir ya mafên neteweyî ên Kurd li Turkiyê de bigîje encamê. Beşdarên pilînomê bi awayek çalak li ser her yek ji wan beşên raporê raya xwe eşkere kirin û bi vî awayî hem rapor pesend kirin û hem jî dewlemendtir kirin. Pilînomê li beşek din ji karên xwe de ayînnameya çend organên hizbê xiste ber basê û piştî tewaya têdîtinan pesend kir.

Beşek din ya karê pilînomê hatibû danîn bo bas li ser kar û çalakî û bernameya karî ya Yekîtiyên Ciwanan, Jinan û Xwendekaran, û piştî gengeşe kirinê, pilînomê piştevaniya xwe ji wan rêkxirawan ducarî kir û amadeyiya xwe bo alîkariya zêdetir eşkere kir. Li dawî beşa karê pilînomê de komek bas û bername bo dahatûya PDKÎ xistin ber dîtingeha beşdaran û biryara hewce li ser hate dan.

Pilînomê piştî çar rojan karê berdewam, seet 7'ê êvariya roja pêncşemî, 29'ê Xakelêweyê dawî bi karên xwe anî.

**PDKÎ**
**Deftera Siaysî**
**30.01.1392**
**19.04.2013**

# Jin û êşa Enfalê




Di 14'ê Nîsana 1988'an de enfalkirina Kurdan gihîşte asteke herî bi tehlûke û piraniya gund û bajarên Kurdan bixwe ve girt. Lewra parlementoya herêma Kurdistana başûr ew roj wek salvegera bi bîranîna vê karesatê diyarî kiriye, û di vê rojê de bi awayek fermî li navxwe û li derveyî Kurdistanê bi awayek hejî ew karesata dijî mirovî tê bi bîranîn, ku ew ji aliyê rejîma sedam Husên ve li çend qonaxên curbicur de hate encam dan.

Piştî vê ku şerê heşt sale ê Îraq û Îranê bidawî hat, li 23'ê Şibata 1988'an derejîma Be's a Îraqê bi armanca qirkirina Kurdan, komek êrîşên leşkerî dest pê kirin, ku piraniya gundên Kurdistanê bi xwe ve girt. Jiber ku gindên Kurdistanê birbireya pişta bingeha aboriya Kurdistanê û şoreşên Kurdistanê bûn. Ew êrîş di rastî de cîbicîkirina sitratejiyeke leşkerî ya berfireh ji bo cînosayda Kurdan, û ji bilî vê heta bo têkdana jîngeh û xwezaya Kurdistanê û lawazkirina civatgeha Kurdî, û derbelêdana ji kesayetiya mirovê Kurd, û şereke tundûtîj û ne însanî bû bi dijî kevneşopî û nirxên pîroz ê Kurdan.

Herweha ew êrîş tenê komkujiya 182 hezar hemwelatiyên medenî nebû, belkû talankirina samana wan hemwelatiyan bûn ku li ser xaka xwe jiyan dikirin. Cudakirina jin û zarokan, û ciwan û pîran, şêwazeke din ya derbe lêdana li kesayetiya mirovê Kurd bû. Ên ku ji destê vê enfalkirinê rizgar bûne, bi xwe bas dikin ku çawan enfalçiyan jin, zarok û mêr dixistin nava çalên kûr de, piştre dikuştin û binax dikirin. Heta gellek kes bi zindî jî binax dikirin.

Hêjayî basê ye ku rejîma Îraqê heşt hezar kurdên Feylî jî enfal kirin. Di 31'ê Temûza 1983'an de heş hezar Barzanî enfal kirin. Di rastî de piştî wan enfalan niha jî gellek ji jinên Kurd her roj hêviya vê hindê ne ku mêr yan bira yan kurên wan ji nişkêve vegerin û yektir himbêz bikin. Belê jinên Kurd bi taybetî ên malbatên efalkiriyan di warê derûnî de weha hatin şikandin, ku heya mirinê ew ê êşa herî mezin ya jidestdana ezîzên xwe bikêşin, û em dikarin bêjin ku wan cehnema xwe li sere rûyê erdê dîtin. Lewra ew niha hejiyê vê hindê ne ku di astê vê êşa giran de deshilata Kurdî xizmeta wan bike, ku aliyê kêm derûna wan û morala wan di astekê de ragire ku bikare jiyanek asayî derbaz bikin.



Hemîd Moxtarî

**Hemîd Moxtarî xwendekarek Kurd ê zankoya selahedîn li bajarê Hewlêrê ye ku lêkolîn li ser jiyana rojnamevaniya şehîd Dr. Şerefkendî kiriye. Ew pirtûk li şeş beş û 117 rûpelan pêk hatiye û li 50 çavkanî û ji çendîn gotûbêjan mifah hatiye wergirtin û ew pirtûk piştî vekolînê wê bikeve ber nirxandinê û piştre wê were çap û bilavkirin.Malpera "Kurdistan media" bona zêdetir ronahîxistina li ser vê mijarê û wergirtina zanyariyên zêdetir li ser armanca vê lêkolînê û hokarê hilbijartina rêberek siyasî bo vî karî, gotûbêjek bi Hemîd Moxtarî re pêk anî, ku eva deqê vê gotûbêjê ye:**




**Kurdistanmedia: Gelo hûn dikarin zanyariyên pitir derheq vê pirtûkê bidin me?**

Hemîd Moxtarî: Pirtûka jiyana rojnamevaniya Dr. Sadiq Şerefkendî, vekolîna ji bo derçûna ji zanîngehê ye ku ji aliyê min ve hatiye pêşkêşkirin, wek beşek ji hewcehiya bidestveanîna bawernameya lîsansê li ragehandinê de.

**Kurdistanmedia: Armanca we ji vê lêkolînê çî ye?**

Hemîd Moxtarî: Armanc ji vê lêkolînê baskirineke hûr û têr û tejî bû li ser jiyana rojnamevaniya Dr. Şerefkendî hem di warê dîrokî, û hem jî di warê şîkariyê de, da ku bibe bingeh û çavkaniyek bona lêkolînên piştre, ku renge li ser vî warî, yan jî li ser tewereke vê lêkolîn bihê kirin.

**Kurdistanmedia: Gelo vê lêkolînê çî alî bi xwe ve girtine?**

Hemîd Moxtarî: Şêweya lêkolînê lêgerîn e. Ew şêweya lêkolînê bi vê hatiye naskirin ku pêk tê ji wan lêkolînan ku lêkoler li pey tiştekê digere ku pêştir li ser vê tu lêkolîneke zanistî nehatibe kirin. Bi awayek din ew lêkolîn tê wateya encamdana lêkolînê li ser diyarokekê ku pêştir tu lêkolînek li ser nehatiye kirin, û lêkoler di vê lêkolîna xwe de pişta xwe girêdaye bi metoda dîrokî - şîkarî, jiber ku baştirîn metoda zanistî ye bo vê lêkolînê, û lêkoler ji riya vê lêkolînê ve dikare bigîje wan armancên ku pêştir wek vekirina derwazeyekê bo lêkolînên piştî xwe destnîşan kirine.

**Kurdistanmedia: hûn wek xwendekareke warê ragehandinê, û herweha lêkolereke vî warî, giringiya vê lêkolînê di çi de dibînin?**

Hemîd Moxtarî: Giringiya vê lêkolînê di wir de ye, ku bi awayek hûr bas ji jiyana rojnamevaniya Dr. Sadiq Şerefkendî dike û lêkoler hewlê dide ku zanyariyên hûr û mijarî (babetî), di vî warî de pêşkêş bike. Ji aliyeke din ve Dr. Sadiq wek yek ji wan kesayetiyên naskirî û xûya, di nav tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd de tê hesibandin, ku tewaya hewla xwe bo serxistina tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd, xistiye kar, bi taybetî di warê rojnamevaniyê de, ku derbasbûyiyeke zêrîn hebûye, lewra min lêkolîna xwe li ser jiyana rojnamevaniya vî kesayetiyê amade kiriye.

**Kurdistanmedia: Gelo hûn di çi ciheke vê pirtûkê de li pey pirsyarkirin yan jî aliyeke veşartî digerin?**

Hemîd Moxtarî: belê, wek:

Dr. Sadiq kî bû?

Jiyana rojnamevaniya Dr. Sadiq çawa û kengê dest pê kir?

Dr. Sadiq Şerefkendî, wek rojnamevanekê çend ji bo buha û pirensîpên demokratîk hewil dida?

Gelo ew peyvên ku ji bo neyarên gelê xwe, bi kar dibe, wek terorîst, cînayetkar û dîktator, çiqas di warê karê rojnamevaniyê de wek pirensîpên demokratîk têne hesêbandin?

Herweha min bona vê ku bikarim ji astengiyên li ser riya karê rojnamevaniyê, ên Dr. Sadiq Şerefkendî agehdar bim, min hewil daye ku ji riya nasandina wan dezgeh û ragehandinên ku Şerefkendî heyamekê berpirsayetiya wan kiriye û herweha nasandina berhemên vî rêberî, bi awayek têr û tejî, û şirovekirina gotarên wî, bersiva beşeke zaf ji wan pirsyaran bidim ku derheq karê rojnamevaniyê a Şerefkendî li hişê xwendevanan de pêk tê.

**Rêzdar Moxtarî! Di dawiyê de heke mijarek heye ku li nav pirsên me de nehatibin, hûn dikarin bêjin?**

Moxtarî: Min hewil daye Dr. Sadiq wek rojnamenûsekê cuda bikim ji rojnamenûsên asayî, û yan jî rojnamenûsên warê geşepêdanê. Jiber ku Dr. Sadiq rojnamenûseke şoreşgêr bû, û armancên rojnamenûsek şoreşgêr cuda ne ji rojnamenûseke asayî, û ezê li rojên bê de, zêdetir lêkolînê li ser vî warî encam bidim, jiber ku hinek aliyên din jî hene wek astê zimanevaniya gotarên Dr. Sadiq ku mixabin bi sedema rênedana beşa ragehandinê min nekarî vê tewerê jî bixme nav lêkolîna xwe de. Jiber ku li gorî biryara beşa ragehandinê nabe tu lêkolînek ji 50 rûpelan zêdetir be, lê min 117 rûpel amade kirine, û dixwazim vê yekê jî bêjim ku yek ji şanaziyên herî mezin ên min ew bû ku ez heyamê heşt salan pêşmergê PDKÎ bûm.

# Gotinên Pêşînan



A: Çiya Mazî

**Divê mirov zanibe serê mirov li ser kîjan kevirî ye:**

Di jiyanê de divê tim haya mirov jixwe hebe û mirov zanibe mirov çi dike an mirov bi ku de bi çi awayî dê here.

**Dîwar bi guh in:**

Ev jî tê wê wateyê ku mirov çi karî bike divê mirov ewlekariya wê çêbike. Mirov di hundir de be jî divê mirov zanibe ku hinek dikarin li mirov guhdarî bikin.

**Dîwarê rast hilnaweşe:**

Tiştên ku mirov çê bike an karê ku mirov bike divê bingeha wî saxlem be û rast be, heke ne wiha be wê xera bibe. Lê dema bingeh saxlem be bi hêsanî xera nabe.


**Diya diza du tira dike, yek ji kêfa yek ji tirsa:**

Kêfa diya diz, bê ku ji zarokê wê re tiştek aniye. Li alîkî din jî tirsa ku bê girtin jî heye.

**Diya mirov tim lawa nayne:**

Wekî bibêje “baş be diya te nikare her tim lawa bîne, an tu here yekî wekî te dibe ku neyê dewsa te”. Dîsa tê wê wateyê ku “her tim karê te baş nare” . Karê tu kesî jî her tim baş nare.

# Şehristana Şahabad



A:Mecîd Rajamî

Şaristana Şahabadê (Îslamabad) yek ji Şaristanên parêzgeha Kirmaşanê ye. Şaristana han bi panahiya 3828 kîlomêtrên çargoşe li başûrê vê parêzgehê de cih girtiye. Şahabad ji aliyê bakûr tevî Şaristanên Pawe û Ciwanro û ji aliyê rojhilat tevî Şaristanên Serpêla Zehw û Gîlana rojava û ji aliyê başûr tevî parêzgeha Îlamê hevsînor e.

Şaristan ji 4 beşên "beşa nawendî", Kirind, Gehwarê, Homeyl û 12 gundistan û 343 gundan pêk tê. Nifûsa Şarsiatnê 250.893 hezar kese û gelê herêmê hemû Kurd û bi zaravê Kurdiya Kelhûrî dipeyvin.

Şahabad duyemîn Şaristana xwdî heşîmet a parêzgeha Kirmaşanê ye û xwediyê girîngiyek zaf a erdnigariyê ye û yek ji şahrêyên girêdana parêzgehên Îlam,Loristan û Xuzisatnê bi bajarê rojavayê Kirmaşanê tê hesibandin û serekîtirîn şahrêya girêdana welatên Îslamî yên rojhilat bi bajarê Îraqê ve ye. Navê yekem bajarê Şahabad ê Arûnava bûye û piştre dibe Mendelî .

Lê piştî êrîşa Ereban bo ser Îranê yek ji serdarên Ereb dest bi awedaniya bajêr dike û bi derbasbûna zeman navê bajêr dibe Harûnawa.

Şahabad li dirêjiya dîrokê de gelek caran navê vê hatiye guherîn û li serdemê Rejîma berê ya Îranê bi Şahabad hatiye guherîn, lê piştî serkevtina Şoreşa gelên Îranê a sala 1979'an bû Îslamabad.

Bajarê Îslamabada niha û Şahabada kevin xwediyê gellek taybetmendiyên aborî û torîstî ye ku ji bo deshelatdarên Îranê li dirêjiya dîrokê de gelek girîng bûye. Hebûna Petrol û herwisa çavkaniyên binerdî yên gelek baş wek, gaz û hesin ûmîs xwe yek ji sedemên girîngiya vê herêmê ye.

Êl û eşîrên Kurd yên ku li herêmê de dijîn hemû bi zaravê Kelhûrî dipeyvin, lê di herêmê de eşîrên wek Zengene, Goran, Sencabî û... hwd jiyanê dikin û kêmtir ji %10 a heşîmeta bajêr pêk tînin.

Kurdên Şaristana Îslamabadê ewên ku li gundan de jiyanê dikin pitir mijûlî heywandarî û xwedîkirina devaran in û gelek ji wan jî mijûlî cotkarî û çandiniyê ne.

Ava çandiniyê a Şaristanê ji çem û çalên avê yên herêmê tên bikaranîn û zaf ji berhemên çandiniyê wek Genim, Ceh,Sêv, Hinar, Qeysî û ...hwd li vê şaristanê berhem tên.

Dewleta Îranê di wan herêman de gelek siyasetên qirêj û gemar ji bo dûrkirina ciwanên Kurd li doza azadiya Kurdistanê dimeşîne û dixwaze bi bilav kirina madeyên hişber li herêmê de pêşiya tevlîbûna ciwanên Kurd bi rêzên xebata azadîxwazane a gelê Kurd li Kurdistana Îranê bigre.







# AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647503640792

## Trombêla Obama Hatibû Dizîn

Dadgeheke Amerîkayê kesek bi tawana dizîna trombêla ku piropagende bo hilbijartina "Barak Obama" dikir, bi 7 salan zîndanê mehkûm kir. Rojnameya "Waşingtonpost" belav kir ku dadgeha hevgirtî a wilayetên Vîrcîniya a Amerîkayê, ragehand piştî wê ku tawanbar ev tawan kêşa stûyê xwe, 7 sal cezayê zîndanê wergirt.

Rojnameya han ragehand ku temenê wî kesî 49 sal e, û di Oktobera 2011 otomobîl dizîye ku Obama ew trombêl di piropagendeyên hilbijartina xwe de bikar dianî.



Di dawiyê de tawanbar hewil daye ku trombêlê bi 200 hezar dolarî bifroşe bazirganekê ku ji nêzîk paytextê Amerîkayê jiyan kiriye, lê bi vî awayî hate girtin.

## Kovara Taym her sal navê 100 kesayetiyên bandordar diweşîne



OCALAN DI LÎSTEYA "TIME" A 100 KESÊN HERÎ BI BANDOR DE CIH GIRT

Persuading enemies that there are alternative ways to resolve long-standing differences takes patience and a willingness to engage in dialogue, but most important, it requires leadership.

Ocalan has demonstrated that leadership. Despite incarceration, he has forged a road map to peace that commits the Kurdish people to democracy and freedom and tolerance. He argues that it is time to

ILLUSTRATION BY DAVID DESPAU FOR TIME

## Mobayla herî giranbuha a cîhanê

Dîzaynêrekî navdar ê Brîtaniyayî bi navê "Stîwart Hiyûze" ku bi çêkirina tiştên ecêb li warê (teknolojiyê) de hatiye naskirin, Ayfoneke li kevirê giranbuha û zêr çêkiriye ku nirxa wê jî 17.8 milyon Dolar e.

"Stîwart Hiyûze" ê şarezayê dîzaynê got: "Amadekirin û çêkirina wê mobaylê 9 heftiyan dom kiriye heya bibe girantirîn mobayl di seranserê cîhanê de.

"Stîwart Hiyûze" ji bo çêkirina rûyê wê mobaylê zêrê 24 eyar û ji bo xemlandina wê jî 600 parçeyên Elmas a Sipî bi kar aniye.



Tewaya dogmeyên wê mobaylê, bi elmasa reş û cûra 26 qîrat guheriye û, monîtora wê ji yaqût û şûşê hatiye çêkirin.

Logoya "Apple"ê jî li pişta mobaylê de bi 50 parçeyên elmasê hatiye xemilandin. Ji ber wê ku nirxa wê zêde giran e, "Hiyûze" biryar da ku mobayleke din mîna mobayla çêkirî, çêbike ku erzantir û bi 39 hezar dolarî be.

## Diya Herî Xirap A Cîhanê

**Li baxçeyekê de li Çînê, hat dîtin ku diya zarokekê cigare bo zarokê xwe vêdixist, û temenê wî zarokî jî ji 5 sal derbaz nedibû.**

Piştî belavkirina wêneyên wê jinê û zarokê wê, li ser malperên civakî gellek komênt bo vê wêneya balkêş hatin danîn. Ji aliyek din ve, ew jin wek xiraptirîn dayk di cîhanê de hat naskirinû wêneyê wê jî wek wêneyek bêhevta tê zanîn.

